Mînaka nameyekê bo dayîk û bavan

Navenda Muqatebûna ji Zarokan
Xiyavan Mal Hejmar Koda ZIP`ê
Bajar
Tel Faks

Sernav Nav Paşnavê dayîk û
Xiyava bav Mal Hejmar
PLZ

Roj

Mijar: Birêxistina serdema xwe wekhevkirinê ya li vê dezgehê-Beşek ji agahiyan bo dayîk û bavan

Dayîk û bavê rêzdar,
Zaroka we yê piştî çend hefteyan serdana yek ji navendên me yên muqatebûna rojane bo zarokan bike. Li wir, ew navend ê riyên teze vebike, zarok ê hînî ciyên teze bibe, xwe bi rêbazên nenas ên rojane ra nasyar bike, gellek zarokên teze bibîne, her wiha di destpêkê da gellek dayîk û bavê nenas bibîne.

Ev gav gist ji zaroka we ra rûdanên girîng çêdikin. Zarok ê şopîner, bi kelecan, ne xwebawer, û renge hinekî jî negîran be.

Bo ku zaroka we vê destpêkê bi serketin pêk bîne û xwe li navenda me ya muqatebûnê rihet hîs bike, pêdiviya zarokê bi piştevaniyê, rênîşandanê û parastina baldarane ji aliyê mezinan va heye.

Em **bi we ra** vê destpêka teze û nû ji zaroka we ra hêsan bikin.

Lewma, hemî zarok li navenda muqatebûna ji zarokan dema xwe ya destpêkê bi ``serdema xwe wehçkhevkirinê`` dest pê dikin, bi taybet bi avê armancê ku veguhestina zarokê ji dinyaya nasyar a malbatê bo dinyayeka nenas û/yan awayê ku navenda muqatebûnê kar dike, hêsan bibe.

Heya ku zaroka we bi ciyê teze ra nasyra be û pêwendiyên pêbawer bi mamosteyên xwe ra çêbike, pêwîst e ku hûn piştevaniyê bikin û di vê serdema destpêkê da bi zarokê ra bin. Hûn wekî dayîk yan bav, hûn ji zaroka xwe ra wê ewlehiyê tînin ku pêdviya wê pê heye sa ku bikaribe bi serketin xwe bi rewşa teze ra bike yek.

Her wiha, ev rê dide we ku wekî dayîk û bav me û karê me yê rojane li navenda muqatebûna ji zarokan nas bikin. Em şa ne ku bi we ra li bara geşepêdana zaroka we, adetên wê û hezkirinên wê bi we ra dipeyvin. Ev danûstandina hevbeş bo karê perwerdeyê bi zaroka we ra girîng e.

Dirêjahiya dema xwe wekhevkirinê
Dema xwe wekhevkirinê li gorî temen û emrê zarokê û tecrubeya zarokê digel kesên din û di rewşên cûr bi cûr da diguhere.Ji temenê 0 hetanî 3 salî, tecrubeyê nîşan daye ku herî kêm hefteyekê dikişîne û li temenê zarokistanê jî herî kêm du hefteyan dikişîne.Hin caran rewşên pêşbînînebûyî tên dîtin ku pêwîst dike ku dema xwe wekhevkrinê dirêjtir bibe.
Qonaxa destpêkê hetanî bo zarokên bi temenê dibistanê jî ev gellekî girîng e.Em ê di pêvajoya xwe wekhevkirinê ya ferdî ya zaroka we da qala hûrgiliyan bikin.

Bo bernamedanîna we girîng e

Em bo dirêjahiya xwe wekhevkirina zaroka we li navenda muqatebûna ji zarokan, pêşniyaz dikin ku hûn demeka **du** yan **sê hefteyî** bidin ber çavan. Pêdiviya zaroka we bi piştevanî û hevrêtiya we di vê demê da heye. Hûn zaroka xwe ra ewlehiyê tînin ku bo xwe wekhevkirina digel rewşa teze pêwîst e.

Eger bo hin sebebên girîng hûn nikarin van karan bikin, kesekî/a din ê/a pêbawer dikare her care bi zaroka we ra were. Lê, em pêşniyaz dikin ku ev kes êdî neyê guhertin. Her wiha, em ji we dixwazin ku bernameya karê xwe yê rojane yê du yan sê hefteyên tên bi awayekî amade bikin ku hûn bikaribin bo demên kurt jî destê me bigihîje we.

Eger mimkin be, piştrast bin ku xwe wekhevkirina zaroka we bi navenda muqatebûna ji zarokan ra bi guhertinên din li malbata we ra nekeve ser hev. Her wiha, em ji we dixwazin ku gerrên xwe yên betlaneyê wisan diyar bikin ku zaroka we bi demeka dirêj yan jî hema demeka kurt piştî qonaxa destpêkê bêpar nebe.
``Tiştên`` nas hi male wekî betanî, bîkên naylonî , pirtûk, wêne yan bûka naylonî ya jêhezkirî, dikarin di dema destpêkê da ku zarok bi dorbera xwe ra nasyar nine gellekî kêrhatî bin. Loma, hewl bidin wan bi xwe ra bînin.

Her wiha, ji kerema xwe ra, li bara adet, rê û resmên zarok û malbata xwe me agahdar bikin.

Birêxistin

Xwe wekhevkirneka serketî ya demê pêdiviya wê bi çarçoveyekê heye ku em bi awayê jêrîn amade dikin:

- Em zarokan li gorî ``qonaxa`` dipejirînin. Bo her hefteyê û her perwerdekarî/ê, zarokek tê pejirandin.
- Zaroka we di dema xwe wekhevkirinê da, tenê li gorî saetan serdana navenda muqatebûnê dike. Xwe wekhevkirina zaroka we ji aliyê perwerdekarekî/a şareza û pispor va pêk tê.
- Zaroka we yê bi pêşketinên hêdî hêdî dorbera teze nas bike.
-
-

Hûn dikarin bi piştevaniya xwe pêvajoya veguhestina zarokê bo navenda muqatebûnê bo zaroka xwe hêsan bikin. Lê, renge cihrengiya hîs û hasten teze bibe sebeb ku zaroka we di hefteyên destpêkê da li ciyê teze xwe xwe mandî û westiyayî hîs bike yan jî bibe sebeb ku zaroka we bertekên ne-asayî nîşan bide.Negîranên vê yekê nebin, ji ber ku beşdariya we ya çalak ê arîkariyê bide ku hûn erkên cûr bi cûr ên geşepêdanê nas bikin ku di vê demê da zaroka we gerek pêk bîne.

Em hêvîdar in ku hûn, zaroka we û em serdema xwe wekhevkirinê bi serketî derbas bikin. Eger pirsên we hebin, em ê şa bibin ku bersivê bidin.Hûn dikarin bi me ra pêwendiyê çêbikin.

Em li benda nîqaşa venêrînan bi we ra ne ku di dawiya dema xwe wekhekirnê da hebin.

Bi hêviya hevkariyên baş

Rêz û hirmet